



**Johann Wolfgang Goethe** (28.08.1749 – 22.03.1832)



***Helbest: Şah Êrl***

***Kurdîkirin: Cankurd***

***Ev wergerandina hozana giranbiha ya hozanvanê mezin Goethe diyariya dilê min e bo nivîskarê me yê navdar û nişperwer hêja Şahînê Bekirê Soreklî ye...***



*Kî ye evê wilo dereng di şev û bayê re pişthesp bûye*

*Ew bav û kurê wî ye*

*Wî lawik baş hembêz kiriye*

*Diparize, û di germiyê de hilgirtiye*

Kurê min, çiye evê tirs li ser rûyê te pêda kiriye?

Bavo, ma tu Şah Êrl nabînî?  
Şah Êrl bi tac û bi sewlecanî

Kurê min, ev rêbaneke mij û dûmanî.

**„Kurê xweşewîst, were bi min re**

**Ezê lîskên xweşik bilîzim bi te re**

**Li qeraxê hene kulîlkên rengîn**

**Bo dayîka min hene seraserên rengîn (1)“**

Bavo, bavo, ma qey tu nabihîsî?

Şah Êrl çi di guhê min digubîsî

Bihêmine, bihêmine, kurê min

Xuşexuşa baye li nav pelên hişk dibin

**„Lawê delal, tu hezdikî bêyî bi min re?**

**Dotên min çavrê dîkin ji te re (2)**

**Dotên min ketine rêzê şevînê, di ber hev re**

**Xwe li ba dîkin, hildiperîkin û distirên ji te re.“**

Bavo, bavo, ma tu nabînî li dera hanê?

Dotên Şah Êrl çavrêdîkin li wa orta rût a hanê?

Kurê min, kurê min, erê ez baş dibînim wê geverê

Lê dixuyin gewrekokên darên berê

**„Ez ji te hezdikim, çelengiya bejmêra te min dikişîne**

**Pêdiviya min wê bi zorê hebe, heger te dil nîne!“**

Bavo, bavo, niha ew digire bi min

Şah Êrl êşek gihande canê min

Bav ditirse û hespê xwe dibezîne

Kurê êşiyayî baş dihembizîne

Bi westayî û pêdivî xwe digihîne malhewşa xwe

Hilgirtiye kurê xwe yê mirî li ser destên xwe

---

(1) Seraser: E'bayê bi ser cilan tê li xwe kirin

(2) Dot: Qîz, keçik (Dayê bibîn, dotê werîn)